*Bidestveanîna mafên netewî yên gelê kurd*
*di çarçoveya Îraneke demokratîk û federal de*

# Agirî

Duheftînameyek Siayasî-Giştî Ye, PDK Îranê diweşîne www.kurdistanmedia.com/kurdî
www.agirimedia.org Hejmar (520)21-06-2026



## Çima gelê Kurd berdewam ji aliyê hikûmetê navendî ve têne tepesekirin?

N. Sîna Qasimî

Dîroka Kurdistanê ne tenê çîroka çiya û berxwedanê ye, ew çîroka girtîgeh, odeyên take kesî û darvekirinê ye ku Kurd bi salan e pê re rûbirû dibe. Ji rejîma Pehlewî ve bigire heta rejîma Komara Îslamî ya Îranê, her gava ku Kurdan ji bo mafên neteweyî, azadiyên siyasî, an parastina nasnameya xwe dengê xwe bilind kirine, bersiva hikûmetên navendî kontrol, îşkence û darvekirin bûye.Li welatekî ku pirsa maf û azadiya netewî wekî sûc hatiye pênasekirin Dom» R:9



## Azadî berhema xwîn û xebatê ye, ne xelata rêkevtina zilhêzan

N. Serbest Urmiyê

Guhertinên dawiyê yên Rojhilata Navîn dîsan pirsa çarenivîsa Kurdan di qonaxeke nû û hestiyar de derbas dike. Piştî Demeke dirêj nakokiyan û şerê vê daviyê deng û basên ku li dor hegere gihîştina Îran û Amerîkayê bi rêkevtinea yekcarekî tên bihîstin, bi terzekê raya giştî ya Kurdistanê haydar kirine ku li dor pêgeha tevgera azadîxwazî ya Kurdistanê di hevrikî û hevkêşeyên nû yên herêmê de tekezê bike û bipirse ka gelo di lihevhatina zilhêzan de para Kurdan heye yan heman av û tasa caran e. Dom» R:4



## Ji Nû Ve Nasandina Têkoşîna Kurdî di Serdema Guherînên Mezin de

N. Dr. Mehmûd Ebas

**Çima Têkoşîna Kurdî Pêdivî bi Nasandineke Nû Heye?**

Di dirêjahiya zêdetir ji sedsalekê de, gelê Kurd yek ji dirêjtirîn û girantirîn rêyên têkoşîna siyasî li Rojhilata Navîn meşand. Ji roja ku Împaratoriya Osmanî hilweşiya û Kurdistan di navbera çar dewletên herêmî de hate parvekirin, tevgera Kurdî ket nav rêçikeke dirêj a berxwedana siyasî û leşkerî. Dom» R:6




# Banga Azadiyê: 46 Saliya Dengê Kurdistana Îranê




Roja 27ê Cozerdanê, 46 sal bi ser damezrandina Radyoya Dengê Kurdistana Îranê re derbas bûn.

Ev radyoya şoreşgê di serdemeke gelekî dijwar de dest bi weşana xwe kir, di demekê de ku Komara Îslamî ya Îranê êrîşeke berfireh a leşkerî û propagandehî kiribû ser destkeftiyên gelê Kurd û tevgera wê ya dêmokratîk.

Di bin siya reş a sîstema sitemkar û daxistina hemû dengên azad de, Dengê Kurdistana Îranê bi peyama Rêberê Şehîd Dr. Qasimlo bû alternatîveke bihêz û banga rastiyê.

Tevî hemû kêmasiyên teknîkî, nebûna îmkanên madî, bombebaranên berdewam û parazîtên giran ên rejîmê, radyoyê tu carî paşvegav neavêt.

Ji ber rastbêjî û weşandina nûçeyên rast û herwext ên xebata Pêşmerge, ev radyo di nava demeke kurt de bû cihê bawerî û herî bilind a raya giştî ya Kurdistan û Îranê.

Dengê Kurdistana Îranê ne tenê damezravekî siyasî û leşkerî bû, belku dibistaneke mezin a rewşenbîrî, çandî û civakî bû.
Radyoyê bi bernameyên xwe şerê bîrûbaweriyên paşverû, parastina mafên jinan, zarokan û neteweyên bêmaf kir.

Herwisa di warê parastina ziman, vêje, dîrok û hunera kurdî de roleke dîrokî lîst. Bi zimanê xwe yê sade û zelal, paqij û rastbêj, vê radyoyê karîbû aloztirîn pirsên siyasî bighîne dil û mejiyê her malekê.

Di vê salvegerê de, em silavên xwe dişînin bo hemû kedkar û têkoşerên ku ev mîrata giranbiha parastin û gihandine vê astê ku heya hemî xelk û bi taybet guhdarên vê yên hêja bi a xwe û dengê xwe bizanin.

Hekî çi îro serdem û amûrên ragîhandinê guhertn bi ser de hatiye û teknolojî roj bi rojê pêş dikeve û serdemê înternêt û ênformatîk û torên civakî û hişê destkird e, erkê me ye ku em li ser vê mîratê, neînku li ser amûrê vê belku li ser xeta şoreşgêrî û resalet û peyamên vê, bi mifahvergirtina ji emrazên pêşkeftî berdewam bin, daku fêm û naveroka vî dengê resen li gorî daxwazên serdem, dewlemendtir û bi bandortir bikin.

Silav li 46 saliya vê banga azadiyê ku hîn jî deng û yad û bîreweriyên vê, li dil û xatira xelkê Kurdistanê û guhdarên vê de maye.

# Gotara Hizba Demokrat li Parlamena Ewropayê

Ev gotar ji aliyê Dr. Kwêstan Gadanî, endama Komîteya Navendî û berpirsa Navenda Rêveberiya Hizbê li derveyî welat ve hat pêşkêşkirin



Di navbera çend salên borî de, têgeha pêkvejiyanê zêdetir ji her demekî dî bûye mijara guftûgoya siyasî li herêma me de. Rojhilata Navîn ku bi dehan sal e di bin bandora şer, desthilatên sitemkar û nedemokratîk, cudakarî û rûbirûbûna nasnameyî de dijî, niha pêwîstiyeke wê ya zêde bi pênasekirina nû ya hevjiyanê heye.

Belê hevjiyan tenê bi wateya nebûna rûbirûbûn û tundûtûjiyê nîne; belku bi wateya durustkirina sîstemeke siyasî û civakî ye ku tê de hemû netewe, ziman, ayîn û nasnameyên cuda bikaribin bi şêwazekî wekhev û bi rêz ve bi hev re bijîn.

Ji perspektîfa Partiya Demokrat a Kurdistana Îranê ve, ev yek ji girîngtirîn pirsiyarên niha yên Îran û herêmê ye jî. Kêşe ew nîne ka em ê çawa cudahiyan jê bibin (bitemizînin), belku ew e ka em ê çawa bikaribin sazî û sîstemeke demokratîk ava bikin ku cudahiyan wekî çavkaniya dewlemendî û hêzê binase, ne wekî gef.

Partiya Demokrat a Kurdistana Îranê di dema zêdetir ji heştê sal xebata xwe de, herdem banga wê yekê kiriye ku çareseriya pirsa Kurd li Îranê tenê di rêya demokrasî, naskirina mafên neteweyî û dabeşkirina dadperwerane ya desthilatê de pêk tê.

Ezmûna dîrokî ya partiyê, ji damezrandina Komara Kurdistanê ve heta berdewamiya xebat û têkoşîna piştî şoreşa 1979an di hemû rûyên wê de û; ezmûn, gotin û paşxaneya zanistî û xebatkariya şehîdên mezin ên wekî Doktor Ebdulrehman Qasimlû û Doktor Şerefkendî, hemû pê li ser wê baweriyê dadigirin ku demokrasî û mafên neteweyî ji yekûdu cuda nabin.

Partiya Demokrat niha jî baweriya wê weha ye ku tu pêşerojeke seqamgîr (îstîqrardar) jibo Îranê bêyî naskirina pirneteweyî, pirzimanî û pirkultûriyê di vê welatî de û misogerkirina mafê pirrengiyan di wê cografyaya siyasî de pêk nayê.

Hevjiyana rastîn di wê demê de durust dibe ku tu hevwelatiyek hest bi wê neke ku jibo ku di civakê de cih jê re bibe, divê nasnameya xwe veşêre yan haş ji mafên bingehîn ên xwe bike. Belê heger biryar e pêşeroja Rojhilatê Kurdistanê û Îranê bi hev re were afirandin, bêguman divê em behsa yek ji girîngtirîn hêzên guhertinê bikin; wate jinan.

Di çend dehsaliyên borî de, jin li Îranê û bi taybetî li Kurdistanê heger qurbaniyên cudakarî û sitemê bûn, belê di kêleka wê de jî wekî karakterekî sereke yê guhertinê derketine holê. Jin di rêxistinên medenî, navendên mafên mirovan, medya, xwendingeh, zanîngeh û rêxistinên siyasî de roleke bibandor û bingehîn lîstine.

Li Rojhilatê Kurdistanê, jinan di dema çend dehsaliyên borî de karîne roleke diyar û bibandor di qadên cuda û corajor ên jiyana giştî ya civakê de bilîzin. Jinên Kurd di nav rêxistinên medenî de, di nav saziyên jinan ên xwebexş de, di çalakiyên parastina jîngehê de, di hewldanên perwerde û hînkirinê de, di medya û parastina mafên mirovan de, bûne hêzeke sereke jibo guhertinê.

Tiştê ku cihê balkişandinê ye ew e ku piraniya van çalakiyên pirberhem jî di bin guşara siyasî û civakî de hatine kirin û ber bi pêş ve hatine birin. Digel vê yekê jî jinan, tevî hemû zeftûzewgên (tundûtûjiyên) hikûmetî û hevdem astengiyên civakî, hergîz ji daxwazên xwe yên jibo azadî, wekhevî û dadperweriyê paşve gav neavêtine.

Her vê xebat, xoragirî (berxwedan) û ezmûnên berhemder jî bûne sedema durustbûna nifşek ji jinên rêber û çalak ku niha di gelek qadan de dengê civaka xwe ne.

Li Kurdistanê, jinan bi şêwazekî taybet karîne ku di navbera xebata jibo wekheviya zayendî, dadperweriya civakî, mafên neteweyî û demokrasî û xebata jibo rizgariya neteweyî de peywendiyê durust bikin. Gelek ji çalakiyên medenî, tevgerên parastina mafên mirovan, hewldanên perwerdeyî û livîna kultûrî bi beşdariya rasterast a jinan ber bi pêş ve gav avêtine.

Di heman demê de, jinên Kurd di diyasporayê de jî bûne parçeyekî girîng ji vê pirsê (proseyê). Li Ewropa, Amerîka û welatên dî yên cîhanê, jinên Kurd di qadên lêkolîn, zanist, ragihandin, mafên mirovan, siyaset û çalakiya medenî de, dengê mafxwazî û armancên Kurdistanê bûne. Girîngtir ji hemû vanan jî, karîne toreke bihêz a hevkarî û hevpiştiyê di navbera jinan de durust bikin.

Ev hevpiştî li ser bingeha wekhevîxwazî, dadperwerî û bergirî ji mafên jinan durust bûye û roleke bibandor hebûye di veguhastina ezmûnan, piştgiriya yekûdu û durustkirina gotarekî hevbeş serbarê azadî û wekheviyê. Vê ezmûnê nîşan daye ku jinên Kurd, tevî dûriya cografî û cudahiya baredox û jîngehê, hestê wan ê hevbeş li hember çarenûsa yekûdu heye û dikarin yek ji bihêztirîn torên hevpiştî û hevkariya civakî durust bikin.

Vê ezmûnê nîşan daye ku şiyana taybet a jinan heye jibo durustkirina pira peywendiyê di navbera pêkhateyên cuda yên civakê de. Di gelek deman de, şiyana jinan heye ku zimanekî hevbeş jibo guftûgû, sazan (lihevhatin) û têgihîştina navbera gruptên cuda durust bikin. Ji ber vê yekê, beşdariya jinan tenê babetekî girêdayî mafên jinan nîne; belku mercekî sereke yê avakirina hevjiyan û demokrasiyê ye.

Partiya Demokrat a Kurdistana Îranê jî di salên borî de hewlyandiye vê baweriyê di nav rêzên xwe de bike rastiyeke siyasî. Bilindbûna asta beşdariya jinan di organên partiyê de, di biryarsazî û di jiyana siyasî ya rêxistinî de, beşek bûye ji têgihîştineke kûrtir di wê têgehê de ku demokrasî û wekheviya zayendî ji yekûdu cuda nabin.

Ev têgihîştin di dirûşma "Jin, Jiyan, Azadî" de bi şêwazê herî baş xwe nîşan dide. Ev dirûşm ku rîşa (kok) wê di ezmûna xebata jinên Kurdistanê de ye, niha bûye zimanê hevbeş ê milyonên kesan li Îran û cîhanê. Hêza vê dirûşmê di wê de ye ku azadiya jinê bi azadiya civakê ve girê dide û vê peyamê dide ku tu civak azad nabe heger nîvê endamên wê civakê ji maf û beşdariya wekhev bêpar werin kirin.

Di rastiyê de, "Jin, Jiyan, Azadî" tenê dirûşma nerazîbûnê nîne; belku perspektîfeke berfireh û pirrû ye jibo pêşerojê. Pêşerojek ku tê de jin nexma (ne tenê) her beşdar û hevpar, belku dê bibin rêberên guhertinê. Pêşerojek ku tê de hevjiyan li ser bingeha dadperwerî, wekhevî û naskirina cudahiyan were durustkirin.


Em di Partiya Demokrat a Kurdistana Îranê de baweriya me weha ye ku pêşeroja Rojhilatê Kurdistanê, pêşeroja demokrasiyê li Îranê û pêşeroja aramî û seqamgîriyê li herêma me, ta asteke zêde bi wê ve girêdayî ye ka jin dê ta çi astê bikaribin bi şêwazekî wekhev û bibandor di prosea biryarsazî û avakirina pêşerojê de beşdar bin.

Herwisa baweriya me heye ku Îrana pêşerojê pêwîstiya wê bi peymaneke nû ya siyasî û civakî heye; peymanek ku li ser bingeha demokrasî, mafên mirovan, piralîbûna (plûralîzma) neteweyî û ayînî, sîstema desthilatê û beşdariya wekhev a jin û mêran were avakirin. Bêyî van binyatan, ne çareseriyeke dadperwerane jibo pirsa Kurd dikare were dîtin û ne jî hevjiyaneke domdar di navbera pêkhateyên Îranê de durust dibe.

Heger em yek ders ji dîroka nû ya Kurdistanê fêr bibin, ew e ku tu projeyeke demokratîk bêyî jinan bi ser nakeve û tu hevjiyaneke domdar bêyî wekhevî û dadperweriyê durust nabe.

Ji ber vê yekê peyama "Jin, Jiyan, Azadî" hêşta ewqas bibandor e; çonki tenê bangewaziyek jibo xoragiriyê (berxwedanê) nîne, belku nexşerêyek e jibo pêşerojeke baştir; pêşerojek ku tê de azadî, demokrasî, wekhevî û hevjiyan binyatên jiyana siyasî û civakî bin.

# Dengê Kurdistanî Îran; Dengê matnekirî yê Kurd



N. Şemal Terxîbî



27ê Cozerdanê, tenê bîranîna rojeke dîrokî bo damezirandina medyayekê nîn e, belku bîranîna destpêka peyamekê ye ku di navbera salên dûr û dirêj de bûye hevparê jiyana gelê me li Rojhilatê Kurdistanê. Ew peyam bi navê «Radyo Dengê Kurdistana Îranê» bû, radyoyek ku di serdemekê de dest bi karê xwe kir ku tê de dengê kurd di gelek waran de hatibû sînordarkirin û hewcehî bi medyayeke xwe hebû daku xelk bikaribin ziman, hest, hêvî û xebata xwe di rêyeke giştî re bigihînin.

Dibe ku îro, di serdema medyaya civakî û weşana zindî de, ji bo nifşê nû zehmet be ku fêm bike radyo di çi astekê de bandordar bûye, lê ji bo hezaran malbatên kurd, bi taybetî li gund û deverên dûrdest, radyo tenê amûreke nûçeyan nebû, belku hevalê şevan, mêvanê malan û pencereyek bû ber bi cîhaneke berfirehtir û zanîna rastiyan.

Dengê Kurdistana Îranê di demekê de hat damezirandin ku civaka Kurdistanê rûbirûyî rewşeke nû ya siyasî bibû û vê rewşa nû jî hewcedarî bi dengekî hebû. Hewcedarî bi wê hebû ku nûçeyên xwe bi zimanê xwe bibîse, kêşe û xemên xwe bibîne û hest bike ku li pişt her malekê û her gundekî, kesên din hene ku mîna wî bîr dikin, mîna wî dijîn û li ser maf û daxwazên wî dengê xwe bilind dikin.

Giringiya wê radyoyê tenê di weşandina nûçeyan de nebû. Di rastiyê de,rola wê ya serekî di avakirina peywendiyeke rûhî û fikrî de bû di navbera beşên cuda yên civaka kurd de. Bernameyên ziman û vêje, stran û huner, çîrok û helbest, nûçe û raporên cûrbecûr, bernameyên taybet bi qatên civakê mîna jin û ciwanan, bîranîna xebat û berxwedaniya şehîdan, hemû pişkdar bûn di parastina nasnameya kurdî û bihêzkirina hesta hevparbûn û hevçarenûsiyê.

Gelek kes hene ku îro temenê wan ji nîvî derbas bûye û ew serdema zêrîn bi çavên xwe dîtine û di bîra wan de ye ka çawa tevî malbat û hevbîrên xwe li dora radyoyê diciviyan, li benda dema weşanê diman û bi dil û can guh didan bernameyan. Ji bo gelek ji wan kesan, Dengê Kurdistanê bû beşek ji bîranînên zaroktî û xortaniya wan, beşek ji jiyana wan a rojane.

Heke behsa dîroka wê radyoyê bê kirin, nabê ew mirov bên ji bîr kirin ên ku li pişt mîkrofofon û studyo û cihên weşanê kar dikirin. Ewên ku di bin şert û mercên giran de, bi kêmtirîn îmkanan, hewl didan ku dengê peyamê neyê birîn. Nivîskar, spîker, teknîsyen, wergêr, hunermend û hemû ewên ku bi awayekî pişkdar bûn di afirandina wî dengî de, di rastiyê de beşek in ji dîroka hevçerx a medyaya kurdî, kesên mîna nemir Taha Etîqî û Muhendîs Xeyatî ku hemû temenê xwe bo dengê Kurdistanê danîn.

Yek ji aliyên herî giring û bandordar ên dîroka Radyo Dengê Kurdistanê, ew xebata dijwar bû ku bo parastina wî dengî hat kirin. Vê radyoyê di rewşeke asayî û aram de kar nedikir. Di nava şer û alozîyên siyasî û leşkerî de jiya. Pir caran studyo û amûrên wê ji cihekî bo cihekî din dihatin veguhastin, û ew veguhastin jî tenê bi Maşîn û rêyên asayî nedibû.

Di navbera salên dûr û dirêj de, amûr û destgehên radyoyê li ser milên pêşmergeyên Kurdistanê dihatin hilgirtin. Dol bi dol, çiya bi çiya û di rêyên dijwar re dihatin veguhastin daku dengê radyoyê neyê birîn. Di demekê de ku erkê pêşmergeyan parastina xwe û hevalên xwe bû, di heman demê de bargiraniya erkê parastina dengekî neteweyî jî li ser milê wan bû.

Ew tiştê ku vê dîrokê bêtir bi qîmet dike ew e ku tevî hemû wan veguhastin û metirsiyan, radyo bo demekê jî ji weşana xwe nesekinî. Her dema ku cihek metirsîdar dibû, cihekî din dihat amadekirin. Her dema ku gefek heba, hewleke nû bo berdewamiya weşanê dihat danîn. Armanc tenê yek tişt bû; ew jî ku dengê Kurdistanê bigihe guhê guhdarên wê.

Komara Îslamî di dirêjahiya wan salan de hewleke mezin da bo bêdengkirina wî dengî. Derdora binkeyên weşana radyoyê dihatin topbaran û katyoşabaran kirin. Hewl hat dan ku bi hêza leşkerî û fişara ewlehiyê ew deng were temirandin, lê ew tiştê ku li hember hêza çekan sekinî, tenê amûrê radyoyê nebû, belku îradeya wan mirovane bû ku baweriya wan bi giringiya peyam û ragihandinê hebû.

Ji ber vê yekê, dîroka Radyo Dengê Kurdistana Îranê tenê dîroka saziyeke medyayî nîn e, belku dîroka berxwedanê ye, dîroka berdewamiyê ye û dîroka bawermendbûnê ye bi we ku deng û peyv, carna mîna çek û cebexaneyê giring û bandordar in. Heke îro bîranîna wê radyoyê tê kirin, beşeke mezin a rêjgirtin ji wan pêşmergeyan e ku di bin befr û baranê de û di navbera dol û çiyayan de mercên mana wî dengî dabîn kirin û nehiştin bêdeng bibe, û bêtirî wê jî bo wan kesên jêhatî ye ku biryara damezirandina wê dan û birêve birin, kesayetiyên mîna şehîdan Dr. Qasimlo û Dr. Şerefkendî.

Îro dema ku navê Radyo Dengê Kurdistanê tê ziman, pêwîst e bi rêz û sipasdarî ve bîranîna wan bikin. Çunku ew tiştê ku wan kir tenê pîşeyeke medyayî nebû. Pir caran karkirin bo medyayeke kurdî tê wateya berpirsiyariyeke mezin a civakî. Wan bawerî bi we hebû ku peyv û deng dikarin bandorê li ser jiyana xelkê bikin û dikarin hêviyekê biparêzin.

Bandora Radyo Dengê Kurdistanê di warên çandî de jî pir diyar bû. Di serdemekê de ku derfeta weşandina berhemên kurdî pir sînordar bû, ev radyo bû şanoyeke berfireh bo stran, helbest û vêjeya kurdî. Gelek dengên hunerî û gelek berhemên edebî di rêya vê radyoyê re gihîştin malên xelkê. Herwisa roleke giring hebû di parastin û belavkirina zimanê kurdî û handana bo xwendin û nivîsandina bi zimanê dayikê.

Em di dîroka gelan de çiqas bigerin, em dibînin ku medya tenê amûrên veguhastina nûçeyan nînin. Ew beşek in ji bîranîna civakî. Beşek in ji wî sîstemê ku alîkariya civakan dike da ku xwe binasin û dîroka xwe biparêzin. Ji wî alî ve, Radyo Dengê Kurdistana Îranê bêtir ji saziyeke weşandina nûçeyan bû, beşek bû ji bîreweriya hevpar a nifşan.

Herçend îro ew radyo mîna berê tune ye, lê bandorên wê winda nebûne. Hinek sazî dibe ku bên girtin, lê şopa wan di hiş û zêhna xelkê de dimîne. Hinek deng dibe ku bêdeng bibin, lê ew tiştê ku di dil û bîranîna mirovan de çandine, berdewam dibe.

Ev roj derfetek e bo we ku em bîr li wateya damezirandina wê radyoyê bikin. Damezirandinek ku di bingeh de bersivdanek bû bo hewcedariyeke rastîn a civakê û şoreşê. Ew hewcedarî îro jî bi awayekî din her maye. Civakek ku dixwaze ziman, çand û dîroka xwe biparêze, her dem hewcedarî bi medyayeke bihêz û berpirsiyar heye. Medyayek ku bikaribe bibe dengê xelkê, nûçeyan bi rastgoyî veguhêze û bihayên çandî biparêze.

Ji ber vê yekê, bîranîna 27ê Cozerdanê tenê bîranîna derbasbûyî nîn e, handanek e bo paşerojê jî. Handanek e bo we ku giringiya medyaya zimanê dayikê neyê ji bîr kirin û keda nifşa beriya me ku rê xweş kirin, bi rêz û sipasdarî ve lê bêt mêzekirin.

Ji ber vê yekê, em serê xwe ditewînin bo bîranîna hemû wan kesên ku di salên cuda de bi awayek ji awayan xizmeta Radyo Dengê Kurdistanê kirin. Ewên ku bi dengê xwe rih didane bigurtirbûna xebatê, qelema wan li dijî dijmin û bo berjewendiya gel hat ser kaxezê, teknîka xwe kirin amûrek bo xizmeta bizavê, bername amade kirin û hewl dan ku ew peyam bigihe guhê xelkê. Herwisa bi rêzdar ve bîranîna wan guhdaran bilind dinirxînin ku bi dil û can guh didan wî dengî û bi hebûna xwe wate didan hebûna radyoyê.

Radyo Dengê Kurdistanê dibe ku îro mîna berê weşanê neke, lê dengê dîrokê hergav namire. Ew deng hêşta di bîreweriya xelkê de dijî, di peyv û bîranînan de deng vedide û wek beşek ji mîrata medyayî û çandî ya Kurdistanê, cihê xwe di dîrokê de parastiye.

# Azadî berhema xwîn û xebatê ye, ne xelata rêkevtina zilhêzan



N. Serbest Urmiye



Nêrînek li dor hegera lihevhatina yekcarekî ya Iran û Amerîkayê û bandorên wê li ser pirsa Kurd
Guhertinên dawiyê yên Rojhilata Navîn dîsan pirsa çarenivîsa Kurdan di qonaxeke nû û hestiyar de derbas dike.

Piştî Demeke dirêj nakokiyan û şerê vê daviyê deng û basên ku li dor hegere gihîştina Îran û Amerîkayê bi rêkevtinea yekcarekî tên bihîstin, bi terzekê raya giştî ya Kurdistanê haydar kirine ku li dor pêgeha tevgera azadîxwazî ya Kurdistanê di hevrikî û hevkêşeyên nû yên herêmê de tekezê bike û bipirse ka gelo di lihevhatina zilhêzan de para Kurdan heye yan heman av û tasa caran e.
Bûyerên mehên borî dane xuyakirin ku Rojhilata Navîn hîn jî qada ji nû ve pênasekirina hevsengiyê di navbera hêzan de ye. Di vê navberê de hêz û tevgera azadîxwaziya Kurdistanê dîsan her weke salên borî selimandiye ku hebûn û berdewambûna wê girêdayî çi hêzeke biyanî ve nîne.

Belku li ser destê têkoşerên Kurd hatiye rêkxistin. Tekoşerên ku bi can feda kirin, di zîndan de û li hember hemû cure karesatên hov ên dagîrkeran de xwe ragirtin û berxwedan da ku rêya azadiya neteweyî hertim ronahî bimîne.

Xwîna şehîdan, berxwedana girtiyên siyasî û berdewambûna nifşên têkoşer di qada xebatê de, semyanek e ku çi peyman û girêbestek di cîhanê de nikare bihayê vê bide.

Hevahengiya siyasî û avabûna hevpeymaniyeke kêmwêne di navbera partiyên siyasî yên Rojhilatê Kurdistanê de, hêviya rizgariyê geştir kir û pêgeha Kurdan di hevkêşe û guhertinên pêşerojê de gihande asteke bilindtir.

Hevpemaniya han di rastî de yek ji girîngtirîn hewlên hevpar ên aliyên siyasî yên Kurd di dehsalên borî de tê hesibandin, ji ber ku yek reng û yek helwest li ser demokrasî, mafê çarenivîsê û guhertina pêkhateyên desthilatxwaz li Îranê de tekezê dike.

Ezmûna dîrokî dide xuyakirin ku nêrîna gelê Kurd li dor siyaseta zilhêzên cîhanê hertim bi parêz û ber guman bûye.

Ji Peymana Cezayîrê ya sala 1975'an bigire, heta bizav û bûyerên salên 1991 û 2025'an û heta ya îro jî, parzûnê bîreweriya siyasî ya gelê Kurdistanê tejû ye ji mînakên ku tê de guhertinên jeopolîtîk bûne sedema bi valakirina pişta tevgera azadîxwaziya Kurdistanê.

Ji ber vê yekê ye jî ku di pêvajoya xebatê de, piştrastbûn bi hêzên biyanî bêyî piştevaniya navxweyî û wergirtina meşrûiyeta ji gel dijwar û ne mumkin şirove dike.
Ev lihevhatina heyî ku biryar e di navbera Waşîngton û Tehranê de pêk bê, berî ku li ser bingehên demokratîk an mafên mirovan be, li ser bingeha realîzma siyasî (realpolitik) û xirîserhevkirina qeyranên herêmî dimeşe.

Di peymannameyên bi vî rengî de, zêdetir parastina hevsengiya hêzê û kontrolkirina çavkaniyên enerjiyê armanc tên girtin.

Li gorî rapor û texmînên ku heta niha di rojevê de ne, naveroka vê lihevhatinê jî heman mijarên ewlehiya herêmî, bernameya navokî, boykot û bazirganiya enerjiyê ye.

Ev yek jî peyameke eşkere ye ku li cem lîstikvanên meydana siyaseta navneteweyî, pirsa Kurd bi giştî ne wekî dosyayeke siyasî ya serbixwe, belku di çarçoveya nêrînên ewlehî û parastina hevsengiya hêzê de tê nirxandin.

Ji ber vê yekê, bawerîanîna bi vê hindê ku hevalbendiya navbera dagirker û zilhêzan bêyî beşdariya Kurdan dê rêya azadiya gelê Kurd berfireh bike, xeyaleke şaş û betal e.
ز
Ev rewş ji bo têkoşer û azadîxwazên Kurd nayê wateya astengkirin û dawîhatina rêyên li pêşberî xebat û serkeftinê.

Heta heke lihevhatinek di navbera Îran û Amerîkayê de pêk bê jî, ev rastiye nahê veşartin ku rewşa Îranê di hemû waran de guheriye û hîn bêtir aloz bûye.

Qeyranên aborî û civakî, pirsgirêkên bêçareser ên rêveberiyê û hevkêşeyên herêmî, delîveyeke nû afirandine ku çalakvanên sivîl û siyasî li Îran û Kurdistanê, pitir ji caran yekgirtî û yekhelwest derkevin qadên xebatê.

**Tevgera azadîxwaziya Kurdistanê gihîştiye wê rastiya girîng ku arîşe û astengiya herî mezin a li pêşiya wê, ne li Waşîngtonê û ne jî li Tehranê ye, belku di hindurê vê tevgerê bi xwe de ye.**

Ew bi temamî haydarî vê yekê ye ku parastin û bihêzkirina yekitiya siyasî, avakirina mekanîzmên hevpar ên biryardanê, berfirehkirina pêwendiyan bi civaka sivîl û nifşên ciwan re û her wiha darêtina bernameyeke siyasî ya zelal ji bo paşerojê, ji faktorên çespandin û bilindkirina asta pêgeha Kurdistanê ne di guhertinên li pêşerojê de.

Ji ber vê yekê, her cure peymaneke di navbera Îran û Amerîkayê de, bigihîje encamê yan na, vê rastiya bingehîn naguhere: Rêya azadiya Kurdistanê têkoşîn, yekitî, hişyarî û fedakarî ye.

Gelê Kurd di dirêjahiya dîroka hevçax de gelek caran di nava agir û tofanan re derbas bûye û her carê bi ezmûneke kûrtir û îradeyeke xurtir rabûye ser piyan.

Bêguman, pêkhatin her peymanekê ku texmîm tê kirin di navbera Îran û Amerîkayê de pêk were, dikare bandor li ser hevkêşe û hevsengiyên jeopolîtîk ên herêmê hebe, lê pirsa çarenivîsa gelê Kurdistanê ne di odeyên girtî û li ser maseyên dîplomasiya zilhêz û dagîrkeran, belku bi amadebûn, hevgirtin û hêza rêxistina tevgera azadîxwaziya Kurdistanê tê çareser kirinê.

Tevgera rizgarîxwaziya Kurdistanê, berî ku girêdayî bi guhertinên demkî yên di siyaseta navneteweyî be, di asteke berfirehtir ji bazneya hevkêşeyên hêzên herêmî û cîhanî de tê şirovekirin.

Ji ber ku ew heqaniyet û hêza xwe ji civaka xwe, vîna gelê xwe û rêkxistinê xwe yên civakî werdigire.

# Dawiya şer û aloziyên Rojhilata Navîn



N. Azad Kurdî



Ji ber rewşa hestiyar û hevkêşeyên herêmî û navdewletî û eqliyeta dewletên deverê li dijî berjewendiyên hev, dibe ku mirov bi dijwarî bikare şiroveya şer û aloziyên Rojhilata Navîn bike bona dawî hatina wan pirsgirên ne çareserkirî.

Lê wisa xuya dike ku hindek şer û nakokiyên stratêjîk yên navbera hindek welatan li Rojhilata Navîn dê aliyê kêm dehan salên din bidomin, ji ber ku zihniyet û mantalîte nehatiye guherin, yek ji wan jî li herêmê pirsa Kurd e.

Rojeva herî germ ya 3 mehên borî ya civaka navdewletî, çêbûna şer û aloziyên rasterast û nêzîk 50 salan yên navbera Dewletên Yekbûyî yên Amerîka û Îsraîl ji aliyekê ligel rêjîma bo dema 40 rojan bû.

Piştî ku wan her du welatan bi hev re nêzîk 20 hezar armancên leşkerî û stratêjîk yên rêjîma Îranê kavil kirin û rêberê wan yê olî û karbidest û fermanderên herî paybilind ên rêjîmê kuştin, agirbesteke demkî hate ragehandin.

Lê alozî her dom dikirin. Bi wan hêrişan, aboriya Îranê kaviltir ji berê lêhhat.
Lê wisa xuya ye ji ber lawazbûna zêde ya rêjîmê weke dewrana şerê 8 salî ligel Îraqê, li gor îdeaya rêveberiya Trump, rêjîma Îranê neçar bûye bona razîkirina Trump û rêveberiya wî hindek pêngavên girîng hilbigire !

Ev yek bûye ciyê gumana wan kesan ku ji nêzîk ve rêjîmê nas dikin ! Lê gelo ev yek dibe dawiya şer û aloziyên 50 salî yên navbera her du aliyan ?

Dijberiya bi Îsraîl û hewildana 48 salan a rêjîma Îranê bona ji nav birina Îsraîlê li ser xarîteya cîhanê, projeyeke olî û îdeolojîk a rêjîmê bûye û heye.

Ji roja ku rêjîma Xomêynî hatiye ser desthilatê heta sala berê ku di şerê 12 rojî de êdî sebra Îsraîlê bi dawî hat û rasterast hêriş kir bo ser makeya fitne û aloziyên herêmî anku rêjîma Îranê, êdî serdemê şerê ne rasterast û bi vekalet ê rêjîmê bo ser Îsraîlê bi dawî hat.

Heta sala 2025'an de, rêjîmê bi rêya grupên terorîstî yên xwe li Lubnan, Sûriye, Yemen û Îraqê bi Îsraîlê re şer dikir, lê piştî bûyerên 7ê Oktoberê, ev yek bi dawî hat bi yekcarî.
Îsraîlê di 12 rojan de rêjîma Îranê kêla.
Ji ber ku bingeha hemû alozî û pirsgirêkên li ser ewlehiya Îsraîlê, bi bername, pere û çekên rêjîmê dihat kirin ji aliyên grupên proxsî.

Lewma ev şer û pirsgirêk olî û îdeolojîk e, heta yek bi dawî ne îne, xilas nabe û dehan salên din jî dem pêwîst e heta zihniyet û eqliteya desthilatdarên herêmê biguhere. Di nav wan pirsgirêkan de jî pirsa Kurd jî ku her bêçareserî maye.

Direjkirin û nûkirina agirbesta navbera Amerîka û rêjîma Îranê bo dema 60 rojên din û destpêkirina got û bêjan li ser pirsgirêkan, diçe heman çarçoveyê.
Yan dibe ku Amerîka paşdekişiyanê ji daxwaz û armancên xwe bike, yan rêjîma Îranê.

Heta vê gavê ku biryar e, roja înê (19.06.2026) bo yekemîn car di 48 salên borî de karbidestên wan her du welatên dijber, li Swîsra vê lihevtêgihîştina ne diyar îmze bikin, her du alî li ser daxwaz û armancên xwe yên şer bi îsrar in ! Di rastî de ev lihevtêgihîştin destpekî ye bo dema 60 rojan, heta şandên her du welatan bi bikarin bi civînan, pirsgirên sereke çareser bikin !

**Îsraîl jî di vê navberê de weke beşek ji şerê 3 alî, heta niha dijberî vê lihevtêgihîştina destpêkî ye û bi fermî ragehandiye ku ev naçin nav pêvajoyê û karê wan bi rêjîma Îranê re xilas nebûye.**

Ji ber hebûn û jiyankirina di Rojhilata Navîn de, Îsraîlî baştir ji Amerîkiyan pirsgirêkên vê herêmê û bi taybet rêjîma Îranê nas dikin.
Lewma dizanin ku rêjîma ji ber bingehên xwe yên îdeolojîk û dirûşmên ku 48 sal in di navxwe de dide peyrewên xwe yên tundajo , nikare paşekişeyê bi wan armancan bike ku Amerîka û Îsraîlê bi hevbeşî ji ber wan li rêjîma Îranê bi xurtî xistin û zirar û derbeyên herî dîrokî li rêjîmê dan.

Armancên Amerîka û Îsraîlê yên sereke kîjan in ku bi 39 rojan şer jî cîbicî nebûn : Bi dawî anîna bernameya Etomî ya Îranê bona ku nekare çekên Etomî çêbike û bidestxistina Uraniyoma meyandî ya 60 ji sedî ji aliyê rêjîma Îranê ve, kêmkirin û astengkirin projeya çêkirina mûşek û hajekên dûravêj ku nekarin ewlehiya Îsraîl û welatên herêmê bixin metirsiyê, herwiha bi dawî anîna hevkarî û piştevaniyên anorî û leşkerî bona dayîna pare û çekan bo gurpên îdeolojîk û tundajo yên nêzîk bi rêjîmê û guhertina siyaset û liv û tevgerên rêjîmê di hemû waran de û heta zêdetir ji vê yekê projeya piştî perde bona hiloşandin û guhertina rêjîmê li Îranê, çend armancên sereke yên Îsraîl û Amerîka bûn ku bêçareserî mane.

Bicî nehatina wan nakokî xistiye navbera Îsraîl û Amerîka jî, lê ger ev yek senariyo pişt perede nebe, heta ku bo 2-3 mehên din rêveberiya Trump bikare demê bikuje û di asta navxwe de serkevtina Komarîxwazan garantî bike û aboriya cîhanê hindekê hêmin bike, piştre bihê ser çareserkirina vê qerana dîrokî ! Ger jî ev pirsên ku Amerîka dixwaze, rêjîma Îranê cîbicî bike, dibe pêvajoyeke nû di dîroka 48 salên borî yên rêjîmê de ku hindek ligel aqilê mirovên ku rêjîmê nas dikin, neguncaw û dûr e ji rastiyê.

Ev pirsgirêk evqas kûr in ku bêy paşdekişiyana yek aliyê şer û bicîanîna daxwaz û ramncên aliyê din, dijwar e agirbesta navbera wan bi dawî bihê û dijhevî û pirsgirêkên herêmî çareser bibin.

# Ji Nû Ve Nasandina Têkoşîna Kurdî di Serdema Guherînên Mezin de



N. Dr. Mehmûd Ebas



*Caucasus Campaign - WWI - Archive Restoration*

**Beşa - 1**

**Çima Têkoşîna Kurdî Pêdivî bi Nasandineke Nû Heye?**

Di dirêjahiya zêdetir ji sedsalekê de, gelê Kurd yek ji dirêjtirîn û girantirîn rêyên têkoşîna siyasî li Rojhilata Navîn meşand. Ji roja ku Împaratoriya Osmanî hilweşiya û Kurdistan di navbera çar dewletên herêmî de hate parvekirin, tevgera Kurdî ket nav rêçikeke dirêj a berxwedana siyasî û leşkerî. Ev berxwedan carinan di serhildanên çekdar de derket holê, carinan di karê veşartî yê partî de, carinan di parastina çand, ziman û nasnameyê de, û carinan jî di lêgerîna hevbendiyên herêmî û cîhanî de.

Lê tevî hemû qonaxên ku herêm tê re derbas bû, tevî guherîna desthilatên siyasî, tevî rûxana rêveberiyên kevn û derketina yên nû, û tevî guherîna hevsengiya hêzên mezin, rêbaza têkoşîna Kurdî di bingehê xwe de gelek caran di heman çarçoveya kevn de ma. Piraniya tevgerên Kurdî xwe li ser wê şêweya klasîk a pevçûna neteweyî ava kirin ku di sedsala bîstan de şekil girtibû. Di wê şêweyê de, hemû xebat li ser sê stûnên sereke disekinî: nasnameya neteweyî, rêxistina partî, û pevçûna siyasî an leşkerî bi desthilata navendî re.

Ev şêwe bê sedem nebû. Ew ji hundirê wê demê derketibû. Cîhana wê rojê cîhana dewletên neteweyî yên tund û giran bû. Tevgerên rizgariya neteweyî jî di heman rewşê de mezin dibûn, di wê rewşê de ku piştî Şerê Cîhanê yê Duyemîn gelek dewletên nû li Asya û Afrîqayê derketin holê. Lewra têkoşîna Kurdî jî nikaribû xwe bi tevahî ji ziman, amûr û hişmendiya wê serdemê dûr bixe.Lê cîhana ku ew rêbaz tê de çêbû, êdî ne ew cîhan e ku îro em tê de dijîn.

Di sê dehsalên dawî de, pergala cîhanî ketiye nav guherînên kûr, bilez û bêpêşîn. Hêz êdî tenê bi artêşê, çekê, sînorê erdê, an destbiser de girtina bajarekê nayê pîvandin. Hêz îro bi aboriya cîhanî, bi zanista pêşketî, bi teknolojiyê, bi şiyana rêvebirina daneyan, û bi cihgirtina di torên bandora cîhanî de tê pîvandin. Ew kes an ew gel ku ji van toran dûr dimîne, her çiqas xwedî dîrokeke mezin û dozeke dadperwer be jî, dikare li derveyî rêya biryardanê bimîne.

Bi şoreşa dîjîtal re, û paşê bi pêşketina bilez a hişê çêkirî û zanista guhertinan, mirovahî ket qonaxeke nû ya avakirina aborî, siyasî û civakî. Ev guherîn ne tenê şêweya bazarê û karê aborî diguherîn, belku têkiliyên siyasî, rêbazên dîplomasiyê, awayê bandora dewletan û heta wateya dewletê bi xwe jî ji nû ve çê dikirin.

Di cîhanekê de ku hêza şirketên derbassînor her roj zêdetir dibe, ku sînorên kevn ên aborî di bin barê bazirganî, teknolojî û daneyan de biçûk dibin, ku berjewendiyên dewletan, şirketan, hêzên darayî û navendên zanistê bi hev re girêdayî dibin, êdî pevçûna siyasî bi rêbazên sedsala bîstan nayê rêvebirin. Ew dem ku dengê gelan tenê bi çek, serhildan, partî û dirûşmeyan digihişt cîhanê, êdî bi serê xwe têr nake. Cîhan guhertiye, qada şerê siyasî jî guhertiye, û amûrên bandorê jî ji nû ve hatine çêkirin.

Li vir pirsiyara giran û biryardêr derdikeve pêşiya hemû tevgerên neteweyî û tevgerên rizgariyê, di nav wan de tevgera Kurdistanî jî:

Ma amûrên sedsala bîstan hîn jî dikarin şerên siyasî yên sedsala bîst û yekê birêve bibin?

Bersiva rast û bê xemlê vê pirsê me neçar dike ku em bi rûyê rastiyê binêrin. Gelek amûrên karê siyasî yê Kurdî hîn jî di bin siya rewşên kevn de mane. Zimanê pevçûnê gelek caran hîn jî li dora têgehên kevneşopî dizivire. Avahiya partiyên siyasî hîn jî gelek caran şêweya serdema Şerê Sar li xwe digire. Gotara siyasî ya hundirîn û derveyî hîn jî bi amûrên kevn dixwaze bi cîhanekî nû re biaxive. Ev ne tenê kêmasiyeke rêxistinî ye, lê kêmasiyeke hizrî ye, ji ber ku cîhan ji pêş ve çûye, lê zimanê me yê siyasî gelek caran li şûna xwe maye.

Lê cîhana ku em îro pê re rû bi rû ne, êdî ne heman cîhan e.

Hevsengiya hêzên cîhanî bêtir tevlihev bûye. Aboriya cîhanî bûye yek ji girîngtirîn çekên bandora siyasî. Teknolojî bûye hêmaneke sereke di parvekirina hêzê de di navbera dewlet, gel, şirket û navendên zanistê de. Di cîhaneke wisa de, tu tevgera siyasî nikare bi heman rêbazên ku berî sed salan hatibûn çêkirin, xwe ji têkçûnê biparêze. Ew ku xwe nû nake, ji aliyê demê ve tê derxistin. Ew ku amûrên xwe neguhere, ji hêla cîhanê ve deng jê nayê bihîstin.

Ev gotin tu carî nayê wateya ku têkoşîna Kurdî şaş bû, an qurbaniyên wê bê wate bûn. Berevajî wê, ew têkoşîn bû ku nasnameya Kurdî ji tunebûnê parast, ziman ji şikestinê ragirt, dîrok ji jibîrkirinê rizgar kir, û doza Kurdî li ser rûyê cîhanê zindî hişt. Lê her têkoşînek ku dixwaze bijî, divê bikare xwe ji nû ve bixwîne. Qurbaniyên me hêja ne, lê armanc û taktîkên me ne pîroz û neguhêrbar in. Armanc dikare sax bimîne, lê amûr divê li gorî demê bêne nûkirin.

Tevgerên rizgariyê yên ku dikarin xwe bi guherînên mezin re biguncînin, tenê ew dikarin berdewam bikin. Lê tevgerên ku di zindana amûrên kevn de dimînin, xwe dixin metirsiyeke mezin: ew dikarin ji rêya dîrokê derkevin, ne ji ber ku doza wan ne rast e, lê ji ber ku zimanê wan ê siyasî êdî nayê bihîstin, û amûrên wan êdî nikarin deriyên cîhanê vekin.

Ji vir ve, pêdivî ye ku tevgera Kurdistanî, bi hemû rengên xwe yên siyasî, hizrî, çandî û civakî, dest bi pêvajoyeke kûr a venêrînê bike. Ev venêrîn ne devjêberdana armancên neteweyî ye. Ne paşvekişîna ji mafên Kurdistanê ye. Ne jî lewazkirina gotara neteweyî ye. Berevajî wê, ev venêrîn hewldan e ku armancên neteweyî ji nav gotarên kevn derkevin û bi amûrên nû, zimanê nû, hişmendiya nû û têkiliyên nû ve bên xurtkirin. Ji ber ku armanceke mezin, heger bi amûrên têkçûyî were şopandin, dikare di rê de winda bibe.

Dibe ku yek ji gavên herî girîng di vê rêyê de avakirina qadeke nû ya ramanê be di nav civaka Kurdî de; qada ku rê bide guherandina nêrîn, pirsên azad, gotûbêjên bê tirs, û şikandina wê hişmendiya ku her cudabûn wek dijminahî dibîne. Tevgera Kurdî îro ne tenê pêdivî bi kongreyên partî heye, ne tenê bi civînên parvekirina kursî û peywir heye, ne tenê bi peymanên demkî yên di navbera rêberan de heye. Pêdivî bi civînên hizrî yên rastîn heye; bi wan cihan ku tê de paşeroja tevgera Kurdistanî bê axaftin, bê nirxandin, bê rexnekirin, û bê ji nû ve avakirin, her çiqas nêrîn ji hev cuda bin jî.

Tevgerên zindî ji cudabûnê natirsin. Ew ji qerisînê ditirsin. Tevgera ku nikare nakokiyê hilgire, nikare paşerojê ava bike. Tevgera ku ji rexneyê ditirse, di rastiyê de ji xwe ditirse. Gelê ku dixwaze di serdema guherînên mezin de xwedî cih be, divê pêşî di hundirê xwe de qada ramanê, qada nîqaşê û qada nûbûnê ava bike.

Di kêliyeke dîrokî de ku Rojhilata Navîn dikeve qonaxeke kûr a ji nû ve şekilgirtinê, û hevsengiya hêza cîhanî bi lezeke bêpêşîn tê guhertin, pirsiyara rastîn ku divê Kurd ji xwe bikin ne tenê ev e:

Em çawa têkoşînê bidomînin?

Lê pirsiyareke kûrtir, girantir û biryardêrtir ev e:

Em çawa têkoşînê bi xwe ji nû ve nas bikin?

Bersiva wan pirsyaran dê bêa bê de dest we xwênerên hêja bikeve

**Dê were domandin...**

## Nerîna Lîderan



**“Xalid Ezîzî”:**

**“ Di Rêkeftina Amerîka û Îranê de xelk Nehatiye Berçavgirtine.”**



**“Jean Noel Barrow”:**

**“Fransa rakirina dorpêçên navneteweyî yên li ser Îranê bi şertê rawestandina tam a bernameya mûşekî, vekirina nû ya Tengava Hurmuzê û bidawîanîna piştgirîya ji komên navçeyî re şert dibîne.”**



**“Benjamin Netanyahu”:**

**“Benjamin Netanyahu peymana muhtemel a Trump bi Îranê re nederbasdar bi nav kir û tekîd li ser serxwebûna operasyonê ya Tel Avîvê kir, rawestana tam a bernameya navokî tenê bijardeya qebûlkirinê dibîne.**



**“Donald Trump:**

**“Ji Îranê re pere nayê dayîn û muhleta 60 rojî didome”**

# Lihevkirina Amêrîka û Rêjîma Îranê, desthilatdarên Tehranê rizgar dike, yan xelkê Îranê



N. Eskender Ceiferî



Wajokirina lihevkirina di navbera Amêrîka û rêjîma Îranê de, pêleke mezin a rexneyan di derdorên siyasî, ragihandin û di nav gelek xelkê Îranê de çê kiriye.

Di demekê de ku berpirsên Amêrîkî vê lihevkirinê wekî gavekê ji bo kêmkirina aloziyan û destpêkirina danûstandinên berfirehtir dibînin, rexneger di vê baweriyê de ne ku tiştê ku rû dide, bêtirî ku di berjewendiya xelkê Îranê de be, alîkariya bihêzkirina pêgeha rêjîma Îranê dike.

Li gorî zanyariyên hatine weşandin, vê lihevkirinê gelek mijarên hestiyar, di nav de çarenûsa bernameya navokî ya Îranê, ji bo danûstandinên pêşerojê bi paş xistiye û tenê çarçoveyek ji bo berdewamiya guftûgoyan amade kiriye.

Rexneya herî girîng a ku tê kirin ev e ku rêjîma Îranê careke din dikare ji dilê qeyraneke navdewletî, bacên siyasî û aborî yên berçav bi dest bixe, bêyî ku guhertineke bingehîn di reftara xwe de bike.

Dijber dibêjin ku salên dirêj ên alozîafirandinê, geşepêdana bernameya navokî, piştgiriya ji komên têrorîstî û afirandina qeyranan li herêmê, niha bûne amrazek ji bo danûstandin û bazarê.

Encama pêvajoyeke wiha ev e ku desthilatdarên Tehranê ne ji ber guhertina reftara xwe, lê ji ber şiyana xwe ya di afirandina qeyranan de, li ser maseya danûstandinê bacê werdigirin.

Yek ji beşên herî nîqaşber ên qefalkirî und kêmkirina zextên aborî ye. Her çend berpirsên Amêrîkî tekez dikin ku tu pereyek bi lez nakeve destê Tehranê, lê rexnegir hişyariyê didin ku rêya rakirina dorpêçan û gihîştina bi çavkaniyên darayî dikare di dawiyê de bi milyardan dolar bixe ber destê rêjîma Îranê.

Ezmûna salên borî jî nîşan daye ku çavkaniyên wiha rewşa jiyana baştir nakin û dibe ku beşeke giring ji wan ji bo bihêzkirina pêkhateyên ewlehî, serbazî û projeyên herêmî yên rêjîma Îranê bê xerckirin.

Nîgeraniyeke din vedigere ser nezelaliyên zêde yên di nav deqa lihevkirinê de. Hin çavdêr hişyariyê didin ku xalên girêdayî Tengava Hurmuz, dawîanîna bi şerê li Libnanê û berpirsiyariyên ewlehiyê, bi qasî pêwîst zelal nîn in û dikarin rê li ber şiroveyên cihêreng vekin.

Rexnegir dibêjin ku rêjîma Îranê di dehsalên borî de gelek caran nîşan daye ku ew valahiyên hiqûqî û nezelaliyên dîplomatîk ji bo pêşvebirina armancên xwe bi kar tîne, lewma her lihevkirineke nezelal dikare di paşerojê de bibe çavkaniya aloziyên nû.Ji aliyekî din ve, gelek çalakvanên mafên mirovan rexne li nebûna mijara mafên welatiyên Îranê di deqa lihevkirinê de girtine.

Di rewşekê de ku dosyeya tepeserkirina xwepêşanderan, girtina çalakvanên sivîl, qedexetiyên berfireh ên siyasî û kontrolkirina tund a qada giştî hîn jî berdewam e, rexnegir dipirsin çima hikûmetên rojavayî careke din amade bûne ku girîngiyê nedin dosyeya mafên mirovan.

Ew di vê baweriyê de ne ku her lihevkirineke ku tenê li ser mijarên ewlehî û navokî bisekine û daxwazên xelkê Îranê piştguh bike, di dawiyê de dê di berjewendiya desthilatdarên Tehranê de bi dawî bibe.

Ev rexne dema ku em li rewşa navxweyî ya Îranê dinêrin, bêtir berçav dibe. Aborî hîn jî bi têkçûn, kêmbûna hêza kirînê, revîna sermayeyê û qeyranên piralî re rûbirû ye. Di rewşeke wiha de, xelkê Îranê nîgeran e ku çavkaniyên darayî yên ji lihevkirinên pêşerojê, mîna rabirdûyê, li şûna ku di pêşesazî, karafirandin û debara jiyana xelkê de bên razandin, bikevin destê saziyên ku tu bersivekê nadin raya giştî.

Herwisa li Amêrîkayê jî ev lihevkirin bi gumanên cidî re rûbirû bûye. Hejmarek ji siyasetvan û çavdêrên Amêrîkî daxwaza weşandina hûrgiliyên bêtir ên lihevkirinê kirine û hişyariyê didin ku ev pêvajo dibe ku bibe sedema bihêzbûna pêgeha stratêjîk a rêjîma Îranê.

Hin navendên lêkolînê jî tekez kirine ku bacên aborî dikarin fersendê bidin Tehranê ku şiyanên xwe yên serbazî, hajekî û navokî nû bike; şiyanên ku di salên dawî de yek ji serekîtirîn mijarên nakokiyê yên di navbera Îran û Rojava de bûn.

Rexnegir herweha di vê baweriyê de ne ku ev lihevkirin peyameke metirsîdar dide hikûmetên nenormal: Ger hûn aloziyê çê bikin, di dawiyê de hêzên cîhanî ji bo kontrolkirina qeyranê dê werin ser maseya danûstandinê û bacê bidin we.

Modêleke wiha ne tenê alîkariya çareserkirina bingehîn a pirsgirêkan nake, lê belê dikare derfetê ji bo dubarebûna qeyranên weha jî amade bike.Lê ew tişta ku ji her tiştî bêtir dibe sedema nîgeraniyê, cudahî û ciyawaziya di navbera berjewendiyên desthilatdaran û daxwazên xelkê Îranê de ye.

Di demekê de ku berpirsên rêjîma Îranê basa serkeftina dîplomasiyê dikin, gelek xelk vê pirsê dike ku para me ji vê lihevkirinê çi ye? Ger encama danûstandinan tenê kêmkirina zextê li ser rêjîma Îranê be û tu guhertinekê di rewşa azadiyên siyasî, mafên mirovan û mercên aborî yên welatiyan de çê neke, dê ev lihevkirin di bîra gelek kesan de ne wekî destkeftiyeke aştiyê, belku wekî bazarek ji bo rizgarkirina desthilatdarên Tehranê bê tomarkirin.

## Zimanek ji Cînsê Qumaşî li Hember Dîrokê



N. Hemîd Çepatî

Nirxandinek li ser felsefeya mayîndebûna nasnameyekê û nîşaneyên nasîna cilên Kurdî bi hinceta Festîvala Zaxoyê.

Lidarxistina festîvala cilên Kurdî di çend rojên derbasbûyî de li bajarekî weke Zaxoyê, dengvedana rengan li qadên giştî, û xuyangkirina şewqa vê cilûbergê û coşa mirovan bo lixwekirina wê li kolan, şeqam, zanîngeh û torên civakî, berî ku bibe pêşangeheke sade, karnavaleke rengan, an jî hewldanek bo kişandina balê, manîfestoyeke zindî ye.

Di serdemekê de ku alavên hovane yên globalîzasyonê û polîtîkayên homojenîzekirina çandî, cilûbergên resen ên neteweyên cûrbecûr daqurtandine û ew dûrxistine bo muzexane an jî vîtrînên xemilandinê yên bêcan, lihevkirina rengan li Kurdistanê wateyeke bi tevahî cûda heye.

Ev meş ne pêşandaneke modayê ye, lê pêşandaneke man û nemanê ye, îlankirina hebûna neteweyekê ye ku bi rêya tekstûra cilên xwe, dîroka xwe ya veşartî diqîre. Ji bo fêmkirina vê vejîna dîtbarî, divê bersiva pirseke bingehîn were dayîn: Di demekê de ku cilên herêmî û xwecihî yên gelek neteweyan li ber modernîteyê hatine jinavbirin, çima cilên Kurdî hîn jî di jiyana rojane de zindî, dînamîk in?
Di civakên xwedî aramî û bê tirs de, cilûberg hilbijartineke kesane ye ku li gorî sîstem û pergala bazarê, rehetiyê û estetîka modern tê guhertin.

Welatiyek li Parîs, Pêken, Berlîn, an Tokyoyê bêyî ku ji windabûna nasnameya xwe ya neteweyî bitirse, tîşortek û pantolonekî cîns (jeans) li xwe dike, ji ber ku muzexane, pasaport, sînor û saziyên siyasî nasnameya wî garantî kirine. Hewcehiya wî bi hilgirtina nasnameya xwe li ser laşê wî nîne. Lê ji bo mirovê Kurd, rewş her gav rewşeke awarte bûye.

Cilûbergên Kurdî qet derfet nedîtine ku bibin tişteke xeyalî, demsalî, an jî tenê folklorîk, ji ber ku pêvajoya xwezayî ya guhertina çandî li Kurdistanê her tim bi amûrên tepeserkirin, înkarkirin û veguherîna derveyî re rû bi rû maye. Dema ku, di demên cûda yên dîrokê de, axaftina bi zimanê dayikê hat sûcdarkirin û navlêkirina zarokan hat sînordarkirin, cilûberg bûn hêla pêşîn a berxwedanê.

Lixwekirina cilên Kurdî li cihên giştî, li cihê kar, li ser rêyên peyatî yên bajêr û di qerebalixiya bazarê de, şêweyeke bêdeng lê bihêz a guh nedana medenî bûye û heye.

Dema jinek bi cilê xwe yê dirêj li şeqaman dimeşe, an jî zilamek bi cilên xwe bi xwebawerî radiweste, ew bi rawestana xwe ya serpêyan, sînorên nedîtî yên erdnîgariyekê û resenbûna neteweyekê destnîşan dikin. Ev cilûberg daxuyaniyeke kolektîf e ku dibêje: Em hene, ji ber ku çanda me nefesê dikêş e.

Di warê rexnekirina kolonyalîzm û hegemonyaya çandî de, têgeheke sereke heye ku jê re "laş weke meydana şer" tê gotin. Dema ku peykerên hêza serdest hewl didin ku zimanekî ji holê rakin, erdnîgariyekê veguherînin û bîra kolektîf a neteweyekê jê bibin, laş ax û keleha dawîn e ku mirov li ser wê xwedî kontrol e. Cilûbergên Kurdî zirx in ku li ser vê laşî têne pêçandin daku ji hêza înkarker re bêjin: "Ez hîn hilneweşiyame."

Cilûbergên Kurdî ne tenê pêçek e, di heman demê de birîneke dîrokî ya vekirî ye ku heta niha jî li ser laşê me maye, mîna alayeke ku di nava qada şer de ji dest neketibe.

Eger cilûbergên herêmî yên gelek neteweyan hatibin tunekirin، çima cilûbergên Kurdî nehatine tunekirin؟ Bersiv hêsan e: Ji ber ku hîn şer ji bo jinavbirina nasnameya Kurd bi dawî nebûye û mirovê Kurd hîna jî divê nasnameya xwe li xwe bike.

Sîstemên totalîter û hegemonîk her tim bi yekgirtî, rengên mirî û dîsîplînên dîtbar ên gewr eleqedar dibin, ji ber ku yekrengî formûlekirin û kontrolkirina civakê hêsantir dike. Li hember vê yekê, cilûbergên Kurdî salnameyeke xwezaya serhildêr, zindî û bêwestan a Kurdistanê ye.

Rengên ku di vê cilûbergê de hatine bikar anîn, şewqa gulgêzkên quntaran, spîtiya berfa çiyayan û keskahiya bêdawî ya demsala biharê, nîşaneyên vê axê ne. Hilbijartina vê qasî ji rengên biryardar û wêreke di cilên Kurdî de,



bi xwe jî guh nedana bi atmosfera fetisî û xemgîniya dîrokî ye.

Bi rêya cilên xwe, Kurdan xemgîniya kûr a trawmayên dîrokî, koçberiyên bi darê zorê û Enfalê veguherandine pîrozbahiyek ji reng û jiyanê. Festîval û hebûna rojane ya mirovan li kolanan nîşan didin ku ev netewe trawmayên xwe ne bi tenêtî û jibîrkirinê, lê bi rêya ji nû ve afirandina domdar a bedewiyê derman dike. Ev cilûberg girêdana zelal a mirovê Kurd bi ax û kevirên welatê xwe re ye.
Guhertina dapoşînê bo cilûbergên modern bi awayekî aştiyane pêk tê dema ku civak hîs dike ku ew dikare bêyî tirs û bi ewlehiyeke tam rêça xwezayî ya guherîna çandî bişopîne.

**Lê ji bo neteweyeke ku bi berdewamî rastî înkar, jinavbirin û êrîşa asîmîlasyona çandî tê, guhertina cilûbergan bi dilxwazî tê wateya qebûlkirina têkçûnê û razîbûna bo windabûnê. Dema ku neteweyek nasnameya xwe weke damezrandî û ji gefan bêpar bibîne, cilûberg dibe meseleyeke tama şexsî.**

Amadebûna berçav û bi mîlyonî ya ciwan û nûciwanan di festîvalên dawî de, li mêvandariyan de û bikaranîna van cilûbergan li zanîngeh û cihên kar nîşan dide ku nifşa nû jî vê hewcedariya dîrokî bi hişmendî fêm kiriye.
Wan bi amûrên nûjen resenî ji nû ve afirandiye, dizanin ku di nebûna saziyên yasayî û navneteweyî de ku wê garantî bikin, divê ew vê alê li xwe bikin. Mayîndebûna cilên Kurdî ne ji ber parastvaniya çandî ye, lê ji ber nebûna şert û mercên ji bo guhertina xwezayî û bê gef e.

Weke Kurd, em bi vê bedewiyê serbilind in. Lê li pişt vê serbilindiyê rastiyeke kûr û hebûnî (Agzistansial) heye: Cilên Kurdî sax mane ji ber ku dîrokê derfet nedaye me û em ji çeka xwe ya çandî xilas nekirine.Ev cilûberg di dirêjahiya dîrokê de parastina herî xweşik، rengîn û mirovî ya neteweyekê ye. Em nasnameya xwe bi zêxkirina gulan (nakış)، bi şalên ku li dora bejnê têne girêdan û bi kenê ku ji resenîbûna me tê, hebûna xwe diparêzin.

Belkî rojek were ku nasnameya Kurd li seranserê vê erdnîgariyê ewqas damezrandî, ewle û bê gef be ku nifşên pêşerojê bikaribin cilûberg tenê weke cil hilbijêrin û li gorî rehetiyê, hewayê an jî tama kesane li xwe bikin. Roja ku zarokên me dê bikaribin mîna her mirovekî damezrandî yê cîhanê cilûberg li xwe bikin, bêyî ku ji jinavçûna reseniya xwe bitirsin.

Di wê rojê de, eger guherînkarî li ser cilên Kurdî pêk bên an jî şêweyeke nû jixwe bigire, ew ne roja mirina nasnameya me ye, lê belê roja serkeftina me ya dawî ye.

Ew roj e ku em êdî ne hewce ne ku barê dîrokê li ser milên xwe û nasnameya xwe li ser laşê xwe hilgirin da ku werin dîtin û îspatkirin. Lê heta wê rojê, ev cil, ev zimanê sor, ev zirxê hevrîşim û ketan, û ev ala me ya bilindkirî، di bayê vê erdnîgariyê de dê her li ba bibe.

# Çima gelê Kurd berdewam ji aliyê hikûmetê navendî ve têne tepesekirin?



N. Sîna Qasimî




**Pêşekî**

Dîroka Kurdistanê ne tenê çîroka çiya û berxwedanê ye, ew çîroka girtîgeh, odeyên take kesî û darvekirinê ye ku Kurd bi salan e pê re rûbirû dibe. Ji rejîma Pehlewî ve bigire heta rejîma Komara Îslamî ya Îranê, her gava ku Kurdan ji bo mafên neteweyî, azadiyên siyasî, an parastina nasnameya xwe dengê xwe bilind kirine, bersiva hikûmetên navendî kontrol, îşkence û darvekirin bûye.

Li welatekî ku pirsa maf û azadiya netewî wekî sûc hatiye pênasekirin, di dîrokê de Kurdan ji bo parastina raman, man û nasnameya xwe bi salan e nirx dane û didin, bi girtin, bi îşkence an jî di dawiyê de cane xwe bo vê yekê gorî kirine. Lêkolîna vê dîrokê ne tenê nirxandinek li ser derbasbûyê ye, ew lêgerînek e ji bo fêmkirina kokên zilmê ku siya xwe diavêje ser jiyanê.

**Nêrîna hikûmetên navendî li hember Kurdan**

Di dîroka hawçerx a Îranê de ji bilî netewa Fars hin netewe hene ku bi salan e heta ji hebûna mafê destpêkî yê ku bo her neteweyekê tê pênasekirin bêpar in. Tevî cudahîyên îdeolojîk ên di navbera rejîma Pehlewî û Komara Îslamî ya Îranê de, her du hikûmet li derheq pirsa Kurd bi nêrîneke û bi çavê ewlehî mêzeyî pirsa Kurd kirine. Di her du serdeman de, daxwazên siyasî, çandî û neteweyî yên Kurdan pir caran ne wekî daxwazek sivîl, belkî wekî gefek li ser desthilatdariya hikûmeta navendî hatiye dîtin. Piştî şoreşa 1357an, rêjîma taze geheştî bi desthilatê anku Komara Îslamî di cihê çareseriyek siyasî ji bo daxwazên Kurdan, di yekem rojên deselatdariya xwe de, dest avête ewlehî kirin û mîlîtarîzeya leşkerî a Kurdistanê. Rejîma Komara Îslamî, piraniya çalakvanên siyasî, sivîl û çandî yên Kurd bi tohmetên wekî "hewldan li dijî ewlehiya neteweyî", "Muharibe" û "mofsidê li ser erdê" girê daye, tohmetên ku di piraniya rewşan de dibine sedema cezayên giran ên girtîgeh û heta darvekirinê jî.

Lê Kurd ti carî li hember xwast û biryarên hikûmetên navendî serê xwe xwar nekirine û dev ji xebata ji bona parastina, ziman, nasname, dîrok û xebata bav û bapîrên xwe bernedane, ev yeke nifş bi nifş li pey xwe cî hêştine û ev bûye beşek ji pênaseya Kurdan. Her ev yeke jî bûye sedemê hindê ku nêrîna hikûmetên navendî yek li dû yekê li beranber pirsa Kurdan weke yek be û her bi yek awayê bersiva xwast û mafê Kurdan bidin, bersivek ku Kurd tenê li girtîgehê, li odeya take kesî, li dûrxistin û li ser darê Îdamê verdigre.

**Cudakariya neteweyî û siyasî**

Ji bilî givaşên siyasî, Kurdistan di heyama van salên borî de bi bêpariyeke aborî û civakî re rûbirû bûye. Rêjeya bêkariyê ya bilind, nebûna derfetên kar û pêşnekevtin li gelek deveran jiyana beşek zêde ji xelkê dijwar kiriye.

Di heman demê de, rewşa ewlehiyê ya li bajarên Kurdistanê û zextên li ser çalakvanên civaka sivîl îmkana şopandina daxwazên aştiyane sînordar kiriye. Beşek zêde kolberên ku ji ber nebûna derfeta kar, neçar bi Kolberiyê bûne, ev digel zêdetirîn metirsiyan rûbirû bûne, metirsiyên weke kuştin û birîndarbûn, dijwariya rê, teqeya rasterast û çend mînakên din. Di rewşên weha de, bêparî û tepeserkirin hevdu bihêz dikin, hejarî zêde dibe û her daxwazek berê ku were bihîstin bi nêrînek ewlehî tê bersivdan.

**Nebûna dadperweriyê di dadgehî kirinê de**

Yek ji nîgeraniyên herî girîng di dosiyeyên siyasî û ewlehiyê de bo Kurdan nebûna dadperweriyê ye. Piraniya girtiyan ji mafê destpêregihîştina bi parêzer bêpar dikin, û gelek caran dadgehîkirin di rewşek ne zelal û heta bi bê hizûra girtiyan bi rê ve diçe.

Di dosiyeyên weha de, dosiye pir caran şûna parastina bersûcan ew li ser rapor û tohmetên dezgeha dadwerî disekine. Ji ber vê sedemê, malbatên girtiyan û çalakvanên mafên mirovan li ser vê bawerê ne ku çarenivîsa piraniya dosyeyan bi awayê selîqeyî û ne dirust e.

Dema ku zelalî di poroseya dadgehiyê, mafê parêzer û serxwebûna dadweriyê diçe bin pirsiyarê, bawerî bi dadperwerî jî zirarê dibîne. Di rewşên weha de, dadgeh, di cihê ku ji bo yasayê penagehek be, dibe amûrek ji bo piştrastkirina biryarên pêşwext.

**Encam**

Di dîroka hevçerx a Kurdan li Îranê de dîrok şahidê têkoşîn û parastina nasname, ziman û mafên wan ên siyasî ye, digel wê yekê ku Kurd berdewam digel tepesekirin, dûrxistin, zext û givaşan rûbirû bûye. Ji serdemê rejîma Pehlewî ve bigire heta Komara Îslamî, siyaseta hikûmetên desthilatdar, li hember daxwazên Kurdan her tim bi yek siyaset û bi yek awayê bûye.

Di dawî de li derheq girtin û kuştina welatiyan dixwazim wê yekê zêde bikim ku li pişt her navekî di lîsteya girtiyan, îdamkirî û qurbaniyên tepeserkirinê de, dehan jiyan tejî ji xeyal û xwezî tên şewitandin, lê bi şewitîna wan xeyalan rêya xebatê bo her takek bi şeref ronî dibe û têna wî agirî dibe sedemê şewitîn û ji navçûna text û bextê dujminên gelê Kurd.



# Îran û Rojhilatê Kurdistanê piştî şer: Civatek di navbera westandin û lêgerîna hêviyê de



N. Sefiye Xalidî




Bidawîhatina şer pir caran bi têgehên wekî aştî, ji nû ve avakirin û vegera jiyana normal ve tê girêdan. Lê di gelek civakan de, bidawîhatina pevçûna leşkerî nayê wateya bidawîhatina krîzê. Dema ku şer raweste lê pirsgirêkên aborî, zextên civakî û astengiyên siyasî berdewam bikin, civak dikeve qonaxek tevlihevtir, qonaxek ku bandorên wê berî her tiştî di derûniya mirovan, têkiliyên civakî û nêrîna wan a li ser pêşerojê de têne dîtin.

Di rewşên weha de, mirov ne tenê bi windahiyên madî yên şer re rûbirû dimînin, belku di heman demê de bi birînên psîkolojîk, bêewlehiya derûnî û hestek bêîstîqrariyê re jî rûbirû dimînin. Bihayên bilind, kêmbûna hêza kirînê, fikarên li ser pêşerojê û dijwarbûna jiyana rojane zextan diafirînin ku bi demê re bandorek kûr li ser derûniya civakê dikin.

Yek ji encamên herî girîng ên rewşên weha diyardeyek e ku psîkolog jê re dibêjin "bêhêviya fêrbûyî". Dema ku mirov bi berdewamî hewl didin ku rewşa xwe baştir bikin lê encamek nabînin, ew hêdî hêdî baweriya ku tu çalakî nikare rewşê biguherîne pêş dixin.

Di vê rewşê de, pirsgirêk ne tenê zehmetiyên heyî ne, ew windakirina baweriyê bi îhtîmala guhertinê ye. Dibe ku kes hîn jî nerazî be, lê dibe ku ew êdî ji bo beşdarbûn, daxwazkirin, an jî plansazkirina pêşerojê ne motîve bibin.

Li kêleka vê diyardeyê, civak bi cureyekî "westandina kolektîf" re jî rûbirû ye. Şer, krîzên aborî û zextên berdewam enerjiya psîkolojîk a mirovan diçînin. Di destpêkê de, mirov hewl didin ku li ber xwe bidin û çareseriyan bibînin, lê gava krîz dirêj dibe, gelek ji wan hêdî hêdî bi jiyana rojane û têkoşîna ji bo jiyanê ve sînordar dibin. Di hawîrdorek wisa de, beşdariya civakî kêm dibe, çalakiyên kolektîf winda dibin, û mirov bêtir li ser rizgarkirina xwe û malbatên xwe difikirin.

Encamek din a girîng pêşketina fikarên kronîk e. Mirov xwedî kapasîteyek mezin in ku li hember krîzên demkurt bisekinin, lê gava ew bi salan bi fikarên li ser pêşerojê, bihayên bilind, bêewlehiya aborî û îhtîmala krîzên nû dijîn, hiş û laş bi berdewamî di bin hişyariyê de ne.

Encama vê rewşê dikare bibe sedema zêdebûna depresyon, bêxewî, hêrs, westandina derûnî û tengezariyên malbatî. Gelek kes hîs dikin ku ew her roj bi fikar şiyar dibin û roja xwe bêyî piştrastbûna li ser pêşerojê bi dawî dikin.

Lê dibe ku krîza herî girîng "hilweşîna asoyê pêşerojê" be. Mirov dikare gelek zehmetiyan tehemûl bike ger bawer bike ku ev zehmetî demkî ne û pêşerojek çêtir li benda wî ye. Karker bi zehmet dixebite ji ber ku ew hêvî dike ku jiyana zarokên wî çêtir be. Xwendekar dixwîne ji ber ku ew pêşerojek geştir xeyal dike.

Welatî beşdarî çalakiyên civakî dibe ji ber ku ew bawer dike ku hewldanên wî/wê dikarin cûdahiyek çêbikin. Lê gava ku mirov êdî nikarin pêşerojek çêtir xeyal bikin, civak bi krîzek wateyê re rû bi rû dimîne.

Di rewşên weha de, di hişê gelek kesan de pirs derdikevin holê: "Ev ber bi ku ve diçe?", "Xala hewildanê çi ye?", "Çima divê ez ji bo pêşerojê plan bikim?" Ev pirs ne nîşanên qelsiya aborî ne, ew nîşanên windabûna hêviyê ne. Û windakirina hêviyê ji gelek aliyan ve ji xizaniya aborî xeternaktir e, ji ber ku ew motîvasyona tevgerê, hewildanê û guhertinê ji holê radike. Di asta civakî de jî encamên kûr hene. Baweriya gel tê hilweşandin, sermayeya civakî qels dibe û hevkariya di navbera kesan de kêm dibe.

Civatek ku baweriyê winda bike dê zehmet bibîne ku derfetên nû bigire, her çend ew derkevin holê jî. Kêmbûna baweriya bi saziyan, belavbûna pesîmîzmê û berfirehbûna cudahiyê di navbera komên civakî yên cûda de şiyana civakê ya çareserkirina pirsgirêkên kolektîf kêm dike.

Lêbelê, ezmûna dîrokî ya gelek welatan nîşan dide ku heta di şert û mercên herî dijwar de jî, hêvî dikare ji nû ve bê zayîn. Hêvî bi gelemperî ne bi sozên mezin û sloganên îdealîst çêdibe, lê belê bi dîtina guhertinên rastîn û serkeftinên piçûk dest pê dike. Dema ku mirov dibînin ku hewldanên kolektîf encam didin, baweriya bi îhtîmala guhertinê hêdî hêdî ji nû ve ava dibe.

Avakirina torên hevgirtina civakî jî di vegerandina hêviyê de roleke girîng dilîze. Dema ku mirov hîs dikin ku ew ne bi tenê ne û yên din jî xwedî fikar û armancên wekhev in, ew bêtir dikarin li hember zextan bisekinin. Hestê hevaltiyê û aîdiyeta civakî dikare hin ji şewitandina psîkolojîk kêm bike û kapasîteya civakê ji bo derbaskirina krîzê zêde bike.

Ji perspektîfa psîkolojiya siyasî ve, hikûmet û avahiyên siyasî ne tenê ji ber nerazîbûna gel tên dijwarkirin, ji ber ku tenê nerazîbûn pir caran dibe sedema pasîfîte û vekişînê. Tiştê ku tevgera civakî diguherîne, têkeliya nerazîbûnê bi hêviya îhtîmala guhertinê re ye.

Civatek ku nerazî ye lê hêviyek ji bo pêşerojê nabîne, bi gelemperî ber bi bêdengî û westandinê ve diçe. Lê civatek ku baweriya xwe bi hêviyek piçûk jî ji bo guhertinê tîne, dikare enerjiya xwe ya civakî ji nû ve bi dest bixe û ber bi beşdarbûn û çalakiya kolektîf ve biçe.

Ji ber vê sedemê, mijara herî girîng di serdema piştî şer û piştî krîzê de ne tenê ji nû ve avakirina aboriyê an jî binesaziyê ye; ew ji nû ve avakirina hêvî, bawerî û hesta bihêzbûna kolektîf e.

Pêşeroja her civakekê kêmtir bi wêrankirina fîzîkî ve girêdayî ye, ew bi wê yekê ve girêdayî ye ku mirovên wê hîn jî baweriya xwe bi îhtîmala avakirina siberojek çêtir tînin.

# Binpêkariyên mafê mirovî li Kurdistanê

## Bidarvekirina 31 girtiyan di çar rojan de, ji aliyê rêjîma mirovkuj ve



Maşîna kuştarê a dîktatoriya olî li Îranê de, ji tirsa serhildana xelkê, tenê di çar rojan de, ji şemiyê heta sêşemiyê 26'ê Cozerdanê, herî kêm 31 girtî hatin bidarvekirin. Bi vî awayî, her sê demjimêran carekê girtiyek hatiye sêdaredanê.
Şemî 23'ê Cozerdanê: Celadan 8 girtî li girtîgeha Qizilhisarê bidarvekirin: Seyîd Ekber Benîhaşim, Emîr Ebas Dekawend û 6 girtiyên din ku nasnameya wan nehatiye aşkera kirin.
Yekşem: 10 girtîcanê wan jê hate standin: Hesen Hisêynî Narûyî û Elîbexş Reîsî ku welatiyên Belûç bûn li Zahedanê, Mecîd Zerînpûr li Şîrazê, Sed'an Hesnî li Hemedanê, Emîn Recebiyan li Şîrwanê, Elî Elîpûr li Amolê, Mihemed Cewad Selmanî li Kaşanê, Seyîd Ednan Mûsevî li Ehwazê, Hesen Fatîmî li Sariyê û Emîr Kefaşî li Şîrazê.
Doşem 25'ê Cozerdanê: 8 girtî hatin bidarvekirin: Mihemed Emîn Narûyî û Belal Seadet-Cîhanî li Bîrcendê ku jî welatiyên Belûç bûn, Aram Zareî li Sineyê, Hemîdrîza Efşarîpûr, Mihemedriza Geşûl û Ferîborz Ceiferî li Îsfahanê, Resûl Etapûr li Tewrîzê û Elî Ehmedî Balsînî li Qezelhesarê.
Sêşemê: 5 girtî bi sêdara mirinê: Omer Şebexş û Xefûr Şebexş ji welatiyên Belûç li Yezdê û Mehmûd Ehmedî li Sineyê.

## Volkêr daxwaza sekinandina bidarvekirinan li Îranê de kir



Rêjîma Îranê ji destpêka sala Zayînî ve zêdetir ji 40 girtî bi tohmetên ewlehî bidar vekirine.
Volker Turk Komîserê Payebilind ê Mafê Mirovî yê Rêkxistina Netewên Yekgirtî ragihand ku ji destpêka sala nû a Zayînî ve heta niha, zêdetir ji 40 girtiyên siyasî û nerazî ji rêjîmê, li Îranê de bi tohmetên pêwendîdar bi "ewlehiya netewî" hatine bidarvekirin ku 18 kes ji wan, xwenîşanderên nerazî bûne.
Herwisa navbirî ragihand ku berpirsên rêjîmê dest avêtine tepeserkirina dujwar û hezaran kes binçav kirine û civaka medenî zêdetir sînordar kirine.
Volker Turk Komîserê Mafê Mirovî yê Rêkxistina Netewên Yekgirtî herwisa pêşewazî ji lihevkirina li navbera Amerîka û paşmaweyên rêjîmê de kir û ragihand ku li vê dema hestiyar de rohn e ku hemû alî dibe li asteke bilind de xweparêziyê bikin û bo birêveçona lezgîn û bi niyeteke erênî bo lihevkirinê, hewlê bidin.
Navbirî daxwaz kir ku hewceye rêjîma Îranê hindî zû sizayê bidarvekirinê bisekinîne û girtiyan serbest bike, û hivî xwest ku mijara şer û agirbest û lihevkirinê, nebe sedemê piştguhxistina rewşa ku li Îranê de bi ser girtiyan de hatiye sepandin.

## Sepandina cezayê 6 sal girtin û 80 qamçiyan li ser hunermendekî kurd



Di berdewamiya pêla tepeserî û derxistina cezayên giran dijî çalakvanên sivîl û hunerî de, Mehdî Pakmêhr, hunermend û stranbêjê kurd ê rûniştvanê Bocnûrdê, ji aliyê dezgeha dadwerî ya Komara Îslamî ya Îranê ve cezayê 6 sal girtîgehê û 80 lêdanên qamçiyan li ser de hat sepandin.
Li gorî raporta Hengawê, Mehdî Pakmêhr ê 41 salî, ku yek ji birîndarên xwepêşandanên meha Befranbara sala borî ye, di du dosyayên cuda de ji aliyê Dadgeha Înqilab û Dadgeha Sûçan a Bocnûrdê ve rûbirûyî vê cezayî bûye.
Berpirsên dadwerî yên rejîmê bi şêwazekî neyasayî û ji bo veşartina hûrgiliyên vê biryarê, ji dayîna kopiya nivîskî ya biryarê bi wî xwe yan bi parêzerê wî, xwe parastiye.
Ev hunermendê kurd di dema xwepêşandanên sala borî de, bi guleyên rasterast ên hêzên rêjîmê lingê wî bi giranî birîndar bibû û paşê di 19'ê Befranbarê de tevî hatibû desteserkirin.
Navborî nêzîkî du mehan di rewşeke dijwar de û bêyî berçavgirtina rewşa wî ya tenduristiyê di girtîgeha Bocnûrdê de hat ragirtin.
Ev hunermedê Kurd berê jî bi hêceta çalakî û hesta neteweyî ve, çendîn caran ji aliyê navendên ewlehî ve, hatibû destbiserkirin.

# Agirî

- Rojnameya “Agirî” di van malperên jêrên de bixwînin:
- www.Kurdistanmedia.com
- www.Agirimedia.org
- rojnamaagiri@gmail.com
- www.facebook.com/Agirikirmanji

Navnîşana derveyî welat: AFKB.P. 102- 75623 ParisCEDEX 13 –FRANCE E - Mail: Agiri2003@gmail.com Hejmar (520)